# KEW

Kew bi reng û dengê xwe yek ji ciwantirîn û navdartirîn balindeyên kûvî ye li Kurdistanê .

Her çende kew balindeyekê kûvî ye, lê kedî dibe û li malan tê bi xweyî kirin.

Kew li rojavaya Asyayê, başûr û rojhelata Ewropayê, bakûrê Afrîka û li Yemenê hene.

Heft coreyên kewan hene:

- Kew derî
- Kewê sor
- Kewê zinaran
- Kewê berberî
- Kewê gozel
- Kewê çolî
- Kewê çîr

Ji van heft corayan, çar li kurdistanê hene: kew derî, kewê gozel, kewê zinaran û kewê çîr. Ji hemûyan mezintir kew derî ye û ji hemûyan biçûktir jî kewê çîr e.

Kew hêlîna xwe li ser erdê çê dike û di mehên Nîsan û Gulanê da ji 8 heta 24 hêkan dike.




KEW



## Ferhengok

**têkst:** deq
**kedî:** kehî
**xweyî:** xudan
**dike:** diket
**minminîk:** belatînk
**kûsî:** kûsele
**bedew:** ciwan, xişkok
**çima:** boçî
**ewqas:** hinde
**rok:** roj
**şûxûl:** kar
**nîvcî:** nîvero
**kenya:** kenî, kire kenî
**Velezya:** dirêjbû
**Siya dar:** sîbera darê

**Xwendevanên xweştivî!**

**Her wekî çawa di zimanan da zarave hene. wesa di zaravan jî da devok hene. Bo nimûne: kurmancî zarave ye. Lê Behdînî, Botanî, serhedî, devokin. Ev du têkstên hûn li jêr dibînin bi zaraveyê kurmancî ne , lê ne bi devoka me ne, lewra hûn dê hest bi hinek cudahiyan bikin û lewra jî me li jêr ferhengokek daniye, ji bo ku hûn wan cudahiyan nas bikin!**

## MINMINÎK

**Eskerê Boyîk**❋

**Carekê kûsî**
**Ji minminîka**
**Bedew pirsî:**

**- Çima ewqas**
**kel û lezî,**
**Hin difirî,**
**Hin dibezî?**

**- Jiyan roke,**
**Şûxûl bere,**
**Ewqas karî**
**Bikim gere.**

**Kar ku nîvcî,**
**Bimîne vir,**
**Wê çi bêjin,**
**Heval hogir?**

**Minminîkê**
**Caba wî da,**
**Lez – bez kete**
**Nava deşta..**

**Kûsî Kenya**
**Bêxem, bêkar,**
**Û velezya**
**Ber siya dar**



❋ **Eskerê boyîk, êk ji helbestvan û nivîskarên navdar ên kurdên sovyeta berê ye. Ew li Ermenistanê jiyaye, lê niha wek penaber li Elmanya dimîne.**